## BERPIRSYARIYA ÎQAMEYÊ; ANGO WELAYET

Pêvajoya qanûnî ya welayetê li Dakotaya Bakur wekî Berpirsyariya Îqameyê tê binavkirin. Dayik û bav bi hev re zewicî bin jî nezewicî bin jî, yek ji wan dikare serlêdana welayetê bike.

Berpirsyariya îqameyê di mercên ku dayik û bav ne bi hev re dijîn de dema her yek dikare bi zarok re derbas bike diyar dike. Dayik û bav dikarin li hev bikin ka kîjan çiqas wext bi zarok re derbas bike ku ji vê re plana dêbavîtiyê tê gotin, yan jî dadgeh li gorî "berjewendiyên baştirîn yên zarokî" biryarê dide.

*Faktorên Berjewendiyên Baştirîn*

Berjewendiyên baştirîn yên zarokî di nav xwe de gelek faktoran dihewîne, wekî:

- Girêdana hezkirin û hestî yên di navber dayik yan bav û zarokî de
- Şiyana dabînkirina xwarinê, cilan, malê, lêçûnên bijîjkî û hawîrdorek ewle ji zarokî re
- Şiyana bicîanîna hewcedariyên pêşketina zarokî
- Têrî û îstîqrara hawîrdora malê, bandora malbata mezin, dirêjiya dema ku zarok li malê ye, û aramiya zarokî li mal û nav civakê
- Yekpareyiya exlaqî wekî ku bandorê li zarokî dike
- Tenduristiya derûnî û laşî wekî ku bandorê li zarokî dike
- Tomarên li mal û dibistanê û bandora guhertinê
- Heke zarok di temenê biryardayînê de be, biryara zarokî (temenekî diyar nehatiye destnîşankirin)
- Delîlên tundiya navmalî
- Têkiliya zarokî bi kesekê/î re ku li malê dijî yan jî pir tê malê
- Hebûna îdiayên pûç ku yek ji dayik yan jî bav zirarê dide zarokî
- Faktorên din yên giring ku divê dadgeh li ber çavan bigire

North Dakota Century Code Section 14-09-06.2

*Faktorên Tundiya Navmalî di Diyarkirina Welayetê de*

Tundiya navmalî dikare bandorê li berpirsyariya welayetê bike. Heke tundiya navmalî pêk hatibe û tenê bûyereke bi birîndariyeke giran yan jî bi bikaranîna çekeke xeternak pêk hatî encam dayî hebe dadgeh dikare biryarê bide ku welayeta zarokî nedin dayik yan jî bavê tundiya navmalî pêk aniye. Dadgeh her wisa dikare îhtîmalê bide hindê ku dayik yan bavê ku tundiya navmalî kiriye welayetê wernegire, heke di dema maqûl ya dadgehkirinê de şopeke tundiya navmalî hebe. Dakotaya Bakur zirara fîzîkî û gefa zirara fîzîkî jî di nav tundiya navmalî de qebûl dike.

Dayik yan bavê ku îhtîmal heye li gorî mercên jorê welyetê nastîne, dikare bi delîlên zelal û qayîlker nîşan bide ku berjewendiya zarokî di hindê de ye ku welyetê bidinê. Dadger dê van delîlan hemû li ber çavan bigire û biryara parvekirina welayetê di destê dadgerî de ye.



Projeyeke ji aliyê NDDSVC ve ji bo we hatiye pêşkêşkirin - Gulan 2020

*Pisporên Lêkolîna dêbavîtiyê*

Heke derbarê siberoja zarokî de gumanên dadgehê hebin yan jî di dozên hevberdanê de ku ji bo welayetê lihevkirinek nîne, dadgeh dikare pisporekî lêkolîna dêbavîtiyê peywirdar bike. Lêkolîner di mijarên welayet, nefeqe û dema welayetê de parêzvanê berjewendiyên bilind yên zarokî ye.

North Dakota Century Code Section 14-09-06.4

*Planên Dêbavîtiyê*

Planeke dêbavîtiyê bernameyeke berfireh e ku ji aliyê dayik û bavan ve tê çêkirin, lê heke dayik û bav nikarin li hev bikin, ji aliyê dadgehê ve tê çêkirin û fermankirin.

Qanûnên Dakotaya Bakur li dayik û bavan ferz dike ku ji bo diyarkirina welayet û demên serdanê planeke dêbavîtiyê hebin. Ev plana dêbavîtiyê ji bo berjewendiyên herî bilind yên zarokî tê çêkirin û divê bi qasî pêkan e berfireh be. Plana dêbavîtiyê ji bo hindê tê çêkirin ku alîkariya diyarkirina rolên dêbavîtiyê û demên welayetê bike û pevçûnan kêm bike da ku dayik û bav siberojê neyên ber dadgehê.

Mînakeke planeke dêbavîtiyê li virê li bin Paragrafên 4 û 18 heye.

*Welayeta Aliyê Sêyemîn*

Bi gelemperî di welayeta zarokekî de dayik û bav li pêş in. Lê belê, heke dayik û bav her duyan zirar dabe zarokî, dadgehek dikare biryarê bide ku welayetê bide aliyekî sêyemîn. Di vê rewşê de welayetê didin temenmezineke/î endama/ê malbatê ya/yê herî nêzîk.

*Bidawîhatina Mafên Welayetê*

Bi gelemperî, yek ji dayik yan bav nikare mafê welayetê yê aliyê din betal bike.

Lê belê, hin rewş hene ku pêkan e mafê welayetiyê ji liyê dadgehê ve bê bidawîkirin. Heke zarok bi tenê hatibe hiştin, sedemên giran hebin, yan jî zarok mehrûm hatibe hiştin, dadgeh dikare mafê welayetê bidawî bike. Îşkence, îstîsmara biberdewamî yan jî îstîsmara cinsî hin sedemên giran in. Heke dayik yan jî bav ji bo tedawiya bendebûna tiryakê yan jî nexweşiya derûnî hewlê nede, pêkan e ku mafên wê/wî yên welayetê bên bidawîkirin. Zarokê mehrûm hatî hiştin ew zarok e, gava tê îhmalkirin û dayik yan bav bi qasî pêwîst pê re eleqedar nabin û îhtîmal e ev ê wisa dewam bike.

Di dozên mehrûmhiştina zarokan de, heke dahata dayik yan bavê tê sûcdarkirin kêm be, pêkan e jê re parêzerek bê anîn. Her çend dadgeh biryara bidawîkirina mafê welayetê nede jî, dikare ferman bide wan ku tiştên din bikin; wekî tedawîkirina zarokî yan jî zarok here li ba xizmên din bijî.

Dakotaya Bakur 27-20-02

*Mafên Dapîr û Bapîran - Welayet û Serdan*

Li Dakotaya Bakur mafê dapîr û bapîran ji bo welyet û serdanê nîn e.

Lê belê, heke mehrûmiyetek hebe dapîr û bapîr dikarin mafê welayeta zarokî wergirin. Zarokê mehrûm hatî hiştin ew zarok e, gava tê îhmalkirin û dayik yan bav bi qasî pêwîst pê re eleqedar nabin û îhtîmal e ev ê wisa dewam bike.

North Dakota Century Code Section 27-20-30

*Derxistina Zarokî bo Derveyî Eyaletê*

Dayik yan bavê ku ji bo îqameyê berpirsyriya pêşî werdigire bêyî biryara dadgehê yan jî destûra nivîskî ya dayik yan bavî nikare zarokî derxe derveyî eyaletê. Wateya vê ev e ku dadgeh dê bibêje ev dayik yan bav dikare zarokî derxe derveyî eyaletê yan jî dayik yan bav dê bi nivîskî destûrê bide.

Lê belê, heke dayik yan bav ji salekê zêdetir e bi zarokî re têkilî danenîbe yan jî bar kiribe eyaleteke din û li ciyekî wisa dijî ku ji zarokî ji pêncî mîlî dûrtir e, pêwistî bi biryara dadgehê nîn e.

North Dakota Century Code Section 14-09-07